

ZIMANÊN DIRUSTKIRÎ¹

Tîpguhêzî: Kenanê Nado

Bi dirêjîya dîrokê mirovan bizav kiriye, ku rêkeka guncaî bibînin ji bo peywendîkirin û têkgehiştinê, rêyek jî afirandin û dahênana zimanî bû. Tişteke xuya ye ku her civakekî li diwîyv pêdiviyên jiyana xwe cure rêkeftinek li ser komele hêmayan ya heyî ji bo armanca birêvebirina kar û erkên xwe yên civakî yên rojane. Helbet ev bizava mirovan di konaxeka rawestayî da nemaye. Belku hemî deman mirovî hewl daye tişteki ji diyarên dor û berên xwe bizanît û zanyariyan jî li dor her diyardeka civakî û hebûna xwe jî peyda biket dîsan ewan zanyariyan jî li gel hevdû alugur biket ji bo vê armancê jî bîr li wî çendê hatiye kirin ku zemanekê cîhanî û sertaserî bihête meydanê bo li hev nêzîkbûnê û aşnabûna netewe û gelan li ser nehênî û bîrkirina hevdû û her armanceka dîtra merem pê heyî. Li vêrê jî heyîyê emaje bi wî çendî bihête dan ku destpêka hizirkirin li zimanên dirustkirî vedigerêteve bo felsefa Kevin a Grîk û Romanan, demê Eflatûnî bîr li wî çendî kirî, ku fereh zimanekî yekgirtiyê harîkar di navbera mirovan

de hebît.

Dîsan li sedê hevdê dúbare hizir li dirustkirin û danana zimanên dirustkirî hate kirin. Nexasime ku di wî demî da diyarda xurtbûna peywendî û alugoriyê di navbera welatan da di qonaxeka geş da bû û viyana wî çendê di nav welatan da peyda bibû ku pêguhurekî bibînin da ku cihê xwe di kur û konferansên navdewletî de bigirît li şûna herdû zimanên inglizî û frensî.


Ji sedê hevdê û heta niho komek zimanên dirustkirî yên bi nav û deng yên hatîne pêş, mîna: (zimanê volapok – 1880, zimanê ingliziya bingehîn – 1890, zimanê jîmareyî deh – dehî, zimanê – 1960, zimanê esperanto-1887 ... htd) ku ev zimanê dumahiyê jî her zimanekî dîtir pitir navdengiya xwe li cîhanê ya wergirtî û bo nimûne dê li jêrî bi kurtî bas lê keyn.

Esperanto:

Mebesta serekî ji her zimanekî dirustkirî, ew e ku kesekî bi tenê

1 Rûpelên: 41-42-43-44-45-46 an

LA ŜAVA ALFABETO



yan ĉend kesekan dirust kiribit, li ser bingehê zimanekî siruŝtî yan pitir ji zimanekî bi wî hêviyê ku bahra pitir ya mirovan bi sanahî di hevdû bigehin.

Zimanê esperanto yek ji wan zimanê dirustkirî ye, ku ji hemiyar pitir navûdengiya xwe li cîhanê wergirtî û bi taybetî jî li hindik welatên wekû (Bolgariya, Vêtnam, Polonya, welatên eskandinavî, Îngiltera, Ferensa ... htd) belave bûye û bingehê dahênana vî zimanî jî vedigerîteve bo hizra zanayê Rûsî (L. Zamenhov 1857- 1917).

Yekîtiya esperantoyîyên nêv dewletî nêzîkî (50) zimanên neteweyî bi xwe ve digirît û peywendiya bi pitir ji (80) welatane ve hindik caran jî konferansên nêv dewletî bo dihêne gêran, dîsan di demê xwe da êzgên radyo û têlevizyonî bi vî zimanî hebûn û heta niho jî hindik ji wan di berde-wam in, zêdebarî hebûna vî zimanî li ser tura înternetê û derkevtina kovar û rojnaman bi vî zimanî.

Zimanê esperanto di warên edebî û zanistî jî da dihête bikaranîn. Wekû

roman û ŝano û hozan û berhemên zanistî û namên master û doktorayê pê dihêne nivîsîn. Mezintirîn kitêbxana esperanto ya li bajêrê (London) û pitir ji (30.000) sihhezar kitêban yên tê da heyîn, belê niho li bahra pitir ya welatên ser bi yekêtiya sovyeta berê dezgehên rewşenbîrî û yaneyên rewşenbîrî û edebî bi vî zimanî dirustkirî yên heyîn.

Sîstemê zimanê esperantoyê bi sanahî ye bo fêrbûnê, ĉunkî yasayên rêzimana vî zimanî bi tenê (16) yasa ne û nêzîkê (40) pêşgir û paşgiran yên heyîn û her peyvek çawa dihête nivîsîn her wisa xwe dihête xwandin û bo her fonîmekê wêneyek (tîpek) ji elîfbêya latînî hatiye hîlbijartin bo her fonîmekê hatiye danan bi vî rengê jêrî:

(A, B, C, ^C, D, E, F, ^G, G, ^H, H, ^I, J, J, K, L, M, N, O, P, R, S, S, T, U, Ŭ, ^V, Z)

Dîsan ji taybetmendiyên vî zimanî, herdem (hêz) dikevîte ser birga dumahiyê ji peyvê, peyv dirustkirin û guhartina wan li diwîyv rêbaza

lêkdana girekan dihête encamdan... htd . bo nimûne eve li jêrî hindek peyvên bi zimanê esperanto li gel peyva berambera wan bi zimanê kurdî : (patro:bab, filîno: kiç, filo: kur, elbaro: daristan ... htd.)

Egerê sernegirtin û sernekeftina zimanên dirustkirî:

Egerê sernegirtina zimanên dirustkirî bi şêweyeke giştî dizivîrêve bo van xalên jêrî:

1- Hestê neteweyî yê her netewekê yê grêdaye bi zimanê wan ê neteweyetî ve, lewra xelkî ew hez û viyan nînin ku fêrî zimanê destkird bibin yan pê gîriyê pê biken.

2- Erê ew rêzimana dihête dirustkirin bo zimanekê dirustkirî, ew şîyan hene cihê rêzimaneka zimanekî sirûştî bigirî?

3- Erê ew ferhenga destkirda hatiye berhevkirin ji çend zimanan dişêt cihê ferhengeka berfireh a sirûştî ya zimanekî girî, dîsan erê dişêt cihê sercem hunerên rewanbêjî û lêkguhurînên watayî ev in di zimanekî sirûştî da dihêne peyrewkirin girî?

Ev e û ji bilî komeleka hokarên dîtir ên civakî û derûnî û mêjûyî û rewşenbîrî ... htd.

Taybetmendiyên zimanên destkerd (dirustkirî):-

1- Dîyalekt tê da nînin.

2- Nawêzeyên rêzimanî tê da nînin.

3- Yê bê laye ne ji layê siyasî ve.

4- Nabîne pêguhur bo zimanên netaweyetî.

5- Bo têgehiştinê di navebera neteweyên ciyawaz da dihête bikarînan.

6- Zimanekî bi sanehî ye bo jiberkirinê, çunkî ew dengên tê da dihêne bikarînan hemî di bê arîşe ne û bi sanehî dihêne gotin û nivîsîn.

Ziman û giyanewerên dîtir

Ziman êke ji wan taybetmendiyên rêdayî jiyana mirovî ve û ev taybetmendî ye li dev zîndewerên dîtir ya lawaz û sinordar e (Girtî ye), ev taybetî ye her ji kevin da cihê serenca zana û feylesofa bû di gelek buweran da vekolîn li ser dihate kirin û girîngiyeka taybet pê dihate dan:

Weku zanayên komelayetî û derûnî û feylesofa ku evana ziman bi rengekê bineretî bimirovî û jîngeha mirovî ve girî diden. Ziman harîkar e bo peydabûna kiriyara têgihîştinê di navbera takekesiyên komelekê diyarkirî da bi rêka zimanî mirov dişêt derbirînê ji dîtir û hestên xwe biket her wesa zanyariya bidete hisên dewrî berê xwe û pêçewane zanyariyan ji wan wergirî.

Ji ber rolê giringê bi jiyana mirovî ve tiştêkî pêdivî ye bi birsiyar li

taybetmendî û xelên serekî yê
evê diyarê bihête kirin, her bo vê
çendê weku aşkera ye zimanê mirovî
ji dengên cuda cuda pêk dihêt û
(zimanê) giyanewerên dîtir jî ji dangan
pêk dihêt, ya fereh evan herdû haleta
jêk cuda bikeyn:

Zimanê giyanewerên dîtir, li
diwîyvçûna anaya da bo dengên
giyanewerên dîtir diyar bo ku hindex
giyanewer dişên berîka derkandina
(nigeq) hindex dengên diyarkirî me-
best bi cih bînin, evê diyarê serenca
zimanvana rakêşa bo girîngiyê bi van
dangan biden û evan dangan digel
dengên mirovan berawer biken, ku
giyanewer bi rêka derkandina hejma-
reka deg û qêjya mebest û pêdiviyên
xwe cê bi cê diken bo nimûne balindê
elhu demê bizavek diyarkirî di firan-
dina xwe da diket, balindiyên dîtir
hest bi tirsê û peydabûna haletê ne
aramiyê diken û ew roj ji layê xwe ve
hindex denga diyar diken ku derbirînê
ji vê haletê tersê biken, hindex zanaya
ev haletên girêdayê bi mirovî bera-
werd kirin bo nimûne:

Demê mirov hest bi tirsê diket dete
qêjî û hewar û dikete qar (dibeztî) û
bêyî ku ageh ji xwe hebit. Rast e ev
halet e li dev mirovî heye bi hilê û
hiku wan haleta nîne demê mirov bi
ristekê yan bi çend ristên rêk û pêk pê
zanînên xwe bigihînete kesên dewr
û berên xwe û bêjîtê (hişyar bin eve
tirsek bi ser me da hat) yan jî bêjît (x

bibarêzin ji filan tiştî û ...).

Bi kurtî ev deng û refarên girêdayê
bi giyanewera di ciyawaz in di gel wî
pêkhatina zimanî ewa li dev mirovî
heyî, ya giyanewera pitir girêdayê
rewiştêkê eybetê (sluk) ji pêkhatina
jiyana wî giyanewerî, pêçewaneyî
zimanê mirovî ku sistemekê tevav e bi
mirovî ve weku giyanewerek serederî
di gel nahête kirin.

Du taybetiyên bineretiyan girêday bi rêkxistina zimanê giyanewer û miro- va yê heyin:

1- Rêkxistina taybet a têgehîstina
giyaneweran rêkxistineka girtî ye (dax-
rawe) ku ev rêkxistine pêk hatiye ji
hejmareka diyarkirî ya qêjî û nîşanên
peywetdîkirinê, her qêjî û nîşaneyek
ji van di reweştêkî yan di hesteka
diyarkirî ya wî giyanewerî diyar dibit.

2- Rêkxistina têgehîstina taybetî bi
giyanewerave girîday hindex haletên
(ne zimanewanî) ye, ev rêkxistina
peywendiyê pêk hatiye ji hejmareka
sînordar ji qêjî û dengên cuda cuda
û bi vê rêkê bi tenê dişên hindex
kiryarên grêdayî berdewambûna
jiyanê encam bidet weku (xwe
parastinê, bergiriyê, bers, xwe veşar-
tin...) ku ev halete pitir di seretayî
ne û nahêne berawerdkirin di gel ew
şiyarên mirovî heyin bo derbirînê ji
(rabirdû, niho, dahatû) yan ew riste
û haletên di jiyanaxwe da guh lê
nebûyî yan ne derkandî.